hejmar 28 çile 2001

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arno

1-6/10

2000

Civîna 28 emîn a Kurmancî di navbera rojên 1-6/10/2000 an de li Xwendegaha Bilind a Biskops Arno, li Swêdê civiya. Beşdarên civînê li ser pirsên trafîk, kompûter û matematîk, li ser devoka Botî, ferhengoka Qerejdaxê, cureyên endamên laş, îdyomên kurdî û peyvên kurdî di zimanên cîran de xebitîn...


Di vê civînê de Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Rojan Hazim (Hekarî), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Newzad Cemal Onursal (Cizîr), Behroz Şucaî (Kotol) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên civînê di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin.

Zimanê partî

Amadekar : Behroz ŞUCAÎ

Zimanên îranî bi awayekî kronolojîk li ser sê serdeman tênê dabeş kirin, ango îranîya kevnar, îranîya navîn û îranîya nû.
Di hêla cografîk de mirov dikare wan dabeşî sê grûpan bike: îranîya bakurî, îranîya rojhilatî û îranîya rojavayî. Zimanên îranî yên rojavayî jî dibin du grûp: bakurê rojavayî û başurê rojavayî.



Hîn di serdema îranîya kevnar de ferqên fonetîkî grûpa bakur ji grûpa başurê rojavayî vediqetand. Wekî yekem zimanê bakurê rojavayî, mirov dikare zimanê Medan, medî bi nav bike. Ji wî zimanî tenê peyv yan navên hin deveran mane. Mirov ji struktura fonetîkî ya van nav û peyvan, dikare bi rêya muqayesekirina di gel farsîya kevnar (zimanê Hexamenişiyan 549 b.z. – 330 b.z.) dikare ferqên van herdu zimanan ji hev derêxe. Heman ferqên fonetîkî ye ku grûpa bakurê rojavayî ji grûpa başurê rojavayî vediqetîne.

Zimanê partî zimanekî bakurê rojavayî ye, ku di serdema îranîya navîn de hatiye bi kar anîn. "Partî", ku ji peyva *parşava* tê, zimanê fermî yê Erşekan/Partên Îranê (250 b.z. – 226 p.z.)bû. Dokumentên herî kevn ji vî zimanî komek nivîsarên li ser perçeyên kûzikan e, ku bermayîyên salên 100-29 b.z. ne.

Şahên sasanî yên serdema pêşîn (ji Şapûrê I 241 p.z.) hin hikayetên xwe hem bi zimanê Erşekan (partan) û hem jî bi zimanê xwe, ango farsîya navîn, li ser rûyê zinaran nivîsandine. Ev zimanê fermî bi ortografîya aramî hatiye nivîsandin, ku wekî îdeogram dihate xwendin. Zanyarîyên frehtir yên li ser vî zimanî, ancax bi rêya tekstên manîkeyî, ku li Turkistana Rojhilat (Turfan) hatine dîtin, ketine destên me. Ew rewşa vî zimanê bakurê rojavayî ya di dema Manî (naverasta salên 200-ê) de, raber dikin. Tekstên manîkeyî bi partî û farsîya navîn bi awayekî fonetîkî bi ortografîya sûrîyak hatine nivîsandin.

Herçendî partî hin peyv ji zimanên din deyn kiribin jî, ferqên fonetîkî, ku li jorê jê hat çêl kirin, kêm-zêde sîstematîkî ne. Lê bê guman, gava ku Sasanîyan birêveberî xistiye destên xwe, gelek termên îdarî ji Erşekan bi mîras wergirtin û nemaze bi heman formê bi kar anîn. Di heman demê de, bi qelsbûna desthilatdarîya zimanên bakurê rojavayî, peyv û dengên zimanê başurê rojavayî, ango farsîya navîn li ser yên din zaltir bû. Lê bi gelemperî hin ferqên fonetîkî yên bingehîn, yên di navbera bakurê rojavayî û başurê rojavayî de, wekî nimûneyên jêrîn in:

bakurê rojavayî			*başurê rojavayî*		
deng	**partî**	**kurdî**	**deng**	**farsî. navîn**	**farsîya nû**
s	masyag	masî	*h*	mahîg	mahî
z	zan-	zan-	*d*	dan-	dan
j	jen	jin	*z*	zen	zen
rd	pirde*	pird, pir, pire	*l*	puhl	pul
rz	burz	berz	*l*	bulend	bulend
hr	hrê	hirê (dimilkî)	*s*	sê	sê
b	ber	ber (dimilkî)	*d*	der	der

Frekansa taybetmendîya fonetîkî ya bakurê rojavayî di kurdîya kurmancî de bilind e. Lê cînartîya bi hezar salan bi farsî re rê ji gelek deynkirinên leksîkalî û fonetîkî re vekiriye. Ji ber vê yekê ye, ku kurmancî û hin zimanên din ên bakurê rojavayî yên serdema nû, ji hinên din, ji bo nimûne kurdiya dimilkî, hîn bêtir di bin bandora fonetîka zimanên başurê rojavayî ango farsî de mane. Kontakta bi sedan salan ya kurmancî bi farsî re, îzolasyon û dûrbûna dimilkî ji farsî, dikarin wek du faktorên sereke vê diyardeyê îzah bikin. Nimûneyên jêrîn vê yekê bêtir konkrettir dike:

farsî û kurmancî: *deh*, lê dimilkî: *des*
farsî û kurmancî: *dil*, lê dimilkî: *zir*
farsî û kurmancî: *erzan*, lê dimilkî: *erjan*
farsî û kurmancî: *sal*, lê dimilkî: *sar*
farsî û kurmancî: *bulend/bilind*, lê dimilkî: *berz*
farsî û kurmancî: *sê*, lê dimilkî: *hirê*
farsî û kurmancî: *der/derî*, lê dimilkî: *ber*

Lê ferqên fonetîkî ya kurmancî di vê hêlê de, ku dijberî rêbaza fonetîkî ya zimanên din yên bakurê rojavayîyî ye, wê ji grûpê dernaxe. Ev guhertin tenê dikare bi deynkirinê bihête îzah kirin. Ji ber ku kurmancî di hêla jenetîkî de, herwekî dimilkî, kurdiyên din, partî û medî, hîn jî divê wekî zimanekî bakurê rojavayî bihête dîtin. Lihevçûnên di navbera kurmancî û partî ne tenê di hêla fonetîkî de, lê herweha di hêla morfolojî û sentaksê de jî dikare bihête dîtin. Her wekî kurmancî, partî jî zimanekî ergatîv bû; taybetmendîya morfosentaktîk, ku van herdu zimanan bi piranîya zimanên îranî yên serdema navîn re parve dikir. Di hêla fonetîkî de goranî û dimilkî xwedî gelek taybetmendîyên arkaîk in, ku bi hêsanî dikare bi lêkolîneke ciddî jî ser partî bihêne îzah kirin.
Rojhilatnasên rojavayî bi gelemperî farsîya nû warisê farsîya navîn û ya navîn jî warisê farsîya kevnar dibînin. Lê gelo ka partî berdewama medî ye û herweha ka kurdî -tevî zimanên din ên bakurê rojavayî– berdewama partî ye, nehatiye îsbat kirin. Di vî warî de lêkolîneke ciddî jî nehatiye kirin.
Ferhengoka jêrîn hewlek e jî bo nasandina zimanê partî û herweha raberkirina binetarên hevpar ên kurdî û partî. Maneya hin peyvên hevpar di navbera kurdî û partî de mumkin e bi wext re ji hev dûr ketibin. Ev diyardeyeke normal e semantîka peyvan e. Lê mebest ji vê ferhengokê nasandina binetarê hevpar ê bêjeyên kurdî û partî ye.

(1) Mebest ji azerî ne tirkîya Azerbaycanê ye. Şêniyên Azerbaycana niha berê bi zimanekî îranî yê bakurê rojavayî dipeyivîn. Bi hatina Tirkan ji Asyaya Navîn û lê bi cîwarbûna Tirkên selçûqî û qaraquyunlu, ji ber ku zimanê azerî li çend gundan îzole mabû, rê li ber belavbûna zimanê tirkî xweş bû.

Ferhenga partî

partî	kurmancî	tirkî	fransizî	înglîzî
ab	av	su	eau	water
abad	ava	bayındır, mürefeh	prospère	prosperous, cared for
aben	avîn	parlak, şeffaf	clair, brillant	bright, clear lustrous
adur	agir, adir	ateş	feu	fire
afros	fêr	ders	leçon, enseignement	teaching, instruction
afrîn	aferîn	dua etmek, kutlamak	bénir	invoke blessings on, bless
agoj	kuj, goşe	köşe	côté	side
ahar	xwarin	yemek	nourriture	food
ajon	vejîn	yeniden doğuş	renaissance	rebirth
aşkareg	eşker, aşkere	açık, belirgin	évident, apparent	obvious, plain
asman	esman	gökyüzü	ciel	sky
astaneg	astank, derazîng, derîzan	eşik	seuil	threshold
asun	asin, hesin	demir	fer	iron
asunên	asinîn, hesinî	demirden	en fer	of iron
axwer	ji lêkera xwarinê xwi-xwer	yiyen	qui mange	eat, consume
axweren	xwarin	yemek, ziyafet	repas, banquet	meal, banquet
awaj	awaz (deng)	ses, çağrı	voix, appel	call
azad	azad	hür, özgür	libre	free
azat	aza, azad	özgür, asil	libre, noble	free, noble
azatîft	azadî, azatî	özgürlük	liberté	freedom, liberty

➤

bend	ben, bend	bağ, ip, iplik	lien, attache, corde	bind, tie
bend-	bendkirin	bağlamak	attacher, lier	to bind, to tie
bar	ber	ürün, meyve	fuit	fruit
bareg	berg, cil û berg	giysi	vêtement, habit	garment, dress, apparel
bareg	bergîr, hespê bargîr	yük atı	cheval, monture	horse, mount
barwer	berwer	ürünlü, ürün veren, verimli	fructueux, productif	fruitful
bazûr	bazû, bask	kol, kanat	aile	wing
bendeg	bende	hizmetkar, köle	serviteur, esclave	servant, slave
bendegîft	bendegî	kölelik, hizmetkarlık	servitude, esclavage	servitude, bondage
bendistan	bendîxane, bendistan	hapishane	prison	prison
ber-	ber-, bir(d)in	götürmek	porter, amener	bear, bring
ber	der, derî	kapı	porte	door
besteg	bestî	esir	captif	captive
behr	behr, par	parça, porsiyon	part, portion	part, portion
bexş-	beş kirin	bölmek, dağıtmak	diviser, distribuer	to divide, to distribute
bezeg	beze, gunehkar	günah dolu	coupable, pécheur	sinful, wicked, evil
bezegîft	bezeyî	günah, kötülük	péché, malice	sin. wickedness, evil
bezekkar	bezekar	günahkar	pécheur, malicieux	sinner, evil doer
bezm	bezm, şahî	şölen, senlik	fête, festin	meal, feast
bexanîg	beganî	ilahi, tanrısal	divin	divine, godlike
bidîg	dî, din	diğer	autre	other, second
bizişk	bizîşk, bijişk	hekim, doktor	médecin, docteur	doctor, physician
boy	bîn, bo, behn	koku	senteur, odeur, encense	smell, scent, incense
boxistan	baxistan, bax, baxçe	bahçe	jardin	garden
brad	bra, bira	kardeş	frère	brother
brazişn	brûsîn, çirûsîn, briqîn	parlama, ışıldama	brillance, éclat	shining, radiance
bun	bin	taban, alt, kök	base, fond, racine, fondement, base,	bottom, foundation, root
bunẍah	bingeh	temel	fondation, assise	base, foundation
burwar	berwar	yüksek, yükseklik	haut, hauteur	high, lofty, height
burz	berz, bilind	yüksek	haut	high, lofty, (loud, loudly for sounds)
burzind	berzî, bilindî	yükseklik, irtifa	hauteur	height

Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de

I. DI ZIMANÊ TIRKÎ DE -III-

Amadekar : Reşo ZÎLAN
Behroz ŞUCAÎ

G

	fransizî	îngilîzî
gâh: *geh, gah*, ***far:*** gah, geh, ***peh:*** gah (ji bo maneya cih)	lieu, -raie-, rie, - thèque	place, -ry
gavur: *gawir, gebr,* (mu'erreb ango forma erebîkirî: *kafir*), ***far:*** gebr, kafer (navê zerdeştiyan piştî hatina îslamê), ***peh:*** gebr	giaour, infidèle	unbeliever, giaour
geda: *gede*, ***far:*** geda	mendiant, miséreux	begger, poor man
gem: *gem, lixab, lixaf*, ***far:*** ligam, ligem, licam, ***yûn:*** *kemos*	mors	bit (of a bridle)
genç: *genc*, ***far:*** genc, ***peh:*** genc	jeune	young
gerdan: *gerden*, ***far:*** gerden, ***peh:*** gerten, gerden	cou, gorge	neck, throat
gerdek: *gerdek*, ***far:*** gerdek	chambre nuptiale	nuptial chamber
gerçi: *gerçî*, ***far:*** gerçi	bien que, quoi que, il est vrai que	although, though, it is true that
gergedan: *kergeden, gergedan*, ***far:*** kergeden	rhinocéros	rhinoceros
gergef: *kerge*, ***far:*** kargah	cadre de broderie	embrodery frame
geriz: *karêz, kerîz, kêzîn*, ***far:*** karîz, kehrîz	égout	sewer, drath
geveze: *geveze, çenebaz, çenesist*, ***far:*** gepbaz, gepbaze	bavard	talkative, babbler
gevher: *gewher, cewher*, ***far:*** goher, coher, ***peh:*** gohr	1) bijou, pierre précieuse; 2) essence	1) gem, jewel; 2) essence, substance
gıdıklamak: *xidxidandin, gidgidandin, qidqidandin*, ***far:*** ẍilẍilek (qilqilek) daden	chatouiller	to tickle
gidi: *gidî*	oh! ah!	pauder
girdap (çıkmaz): *gerav, gerînek*, ***far:*** girdab	tourbillon	whirpool
gonca: *xwençe, xunçe*, ***far:*** ẍonçe, ẍunce	bouton (de rose, de fleur)	bud, rosebud
göç: *koç*, ***far:*** *kûç*	migration, transhumance	migration, transhumance
göçer: *koçer*	nomade	nomade
göl: *gol*	lac	lake
gurk: /gurklamak: *kurk*, ***far:*** kork	couveuse (poule)	broody (hen)
güğüm: gumgum, ***far:*** qumqumê, ***lat:*** kukumion	carafon en cuivre	copper jugg with handle
gül: *gul*, ***far:*** gul, ***peh:*** gul	rose	rose
gülab: *gulav*, ***far:*** gulab	eau de rose	rose water, julep
gülçin: *gulçîn*, ***far:*** gulçîn	cueilleur de rose	who gather roses or flowers
güldan: *guldank, guldan*, ***far:*** guldan	vase	rose bowl
güldeste: *guldeste*, ***far:*** guldeste	bouquet	bouquet, bunch of flowers
bouquet gülendam: *gulendam*, ***far:*** gulendam	qui a la taille fine et grâcieuse comme une rose	who has a waist as slender as a nose
gülgün: *gulgon*, ***far:*** gulgûn, gulgon	couleur de rose, rose	rose colored, rosy
gülistan: *gulistan*, ***far:*** gulistan	roseraie	rose garden
gülizar: *gulîzar*, ***far:*** gul´izar	qui a des joues roses	rosy-cheeked
gülle: *gulle*, ***far:*** gulûle	obus	shell, cannon ball
gülnar: *gulhinar, gulhenar*, ***far:*** gulnar	couleur de grenadier	of the colour of pomegranite
gülrenk: *gulreng*, ***far:*** gulreng	couleur de de rose, rose	rosy, rose coloured
gülşen: *gulşên*, ***far:*** gulşen	roseraie	rose garden
gülten: gulten, ***far:*** gulten	qui a un teint de rose, fraîcheur et rose	rose-bodied, fresh and aninty
gülzar: *gulzar*, ***far:*** gulzar	jardin de fleur, roseraie	flower garden, rose garden
günah: *guneh, gune*, ***far:*** guneh, gunah, ***peh:*** winah	péché	sin
günahkar: *gunehkar*, ***far:*** gunahkar, ***peh:*** winahgar	pécheur	sinner, culprit
gür: *gurr, gûr*, ***far:*** gurr	touffu, dense	thick, abdundant, dense
güruh: *gurûh*, ***far:*** gurûh, ***peh:*** groh	gang, bande	gang, band
gürz: *gurz*, ***far:*** gorz	masse, massue	iron club, nace
güya: *goya*, ***far:*** gûya	soi-disant	so-called

Devoka Qerejdaxê

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	tirkî	fransizi	înglîzî
velîstin	ürkmek, şok geçirmek, çarpılmak	être effrayé, subir un choc, être traumatisé	to be frightened, traumatised, shocked
velo kirin	ağızdaki yiyeceği yutmadan dışarı çıkartmak	rendre gorge, restituer la nourriture	to bring up unswallowed food, spit up
vemaltin, vemaliştin; malîn, vemalîn	temizlemek	nettoyer	to clean, to clean up
veweşandin : daweşandin	silkelemek	secouer, ébranler	to shake off (dust, etc.)
xwe veweşandin : xwe daweşandin	silkenmek	s'épousseter, secouer ses vêtements	to dust oneself, shake off one's clothes
xwe vexistin : xwe dirêj kirin, veketin	yatmak, uzanmak	s'allonger, s'étendre	to lie down
vêra : bi wê/wî ra	birlikte, onunla	avec lui/elle	with him/her
vino, vinvinokî : ginginokî, xinxinokî	burnundan konuşan, genzek	nasillard	nasal, who speaks through the nose
vinevin kirin	burnundan konuşmak, anlaşılmaz şeyler söylemek	nasiller, parler d'une façon inintelligible	to speak through the nose, to be incomprehensible
virik, vîjik : navçûyîn, zikçûyin, navêşî, zikêşî	ishal	diarrhée	diarrhea
virikî,, vîjikî bûyîn	ishal olmak	avoir la diarrhée	to have diarrhea
bû vinevina wî, me tu tiştek jê fam nekir	burnundan birşeyler söyledi, ne söylediği hiç anlaşılmadı	on n'a rien compris à ce qu'il disait à travers le nez	we understood nothing he said through his nose
virnî	geç doğmuş olan hayvan	animal né tardivement, après le terme	animal born late in the season
hilî	vaktinden önce doğan	prématuré, qui naît avec le terme	premature
xubarî	erken olmuş, erken	précoce	precocious
vîz kirin	döndürmek	faire tourner, pivoter	to pivot, to revolve, to turn
vîz bûn	dönmek	se tourner, se retourner	to turn round, to turn, to spin
vîç vîç, vîçevîç : wîcewîc, çîkeçîk	cıvıldama	pépiement, gazouillement, gazouillis	twittering, chirping
qideqid, qid qid	gıdaklama	gloussement	clucking
vîjo	ishalli, ishal olan	qui a la diarrhée, diarrhéique	diarrheic
wakîno : waniko, wa, weha, wilo, wisa	öyle, böyle	ainsi, tel, comme cela	so, thus, such
waqînî : wazqînî	çığlık, feryat, ağlama sesi	cri de douleur	a cry of pain
waqînî pê ketin	acıdan feryat etmek, çığlık atmak	pousser un cri de douleur	to cry with pain
warge	kamp yeri, yurtluk	emplacement de camp, lieu de campement	camping ground
wawîk : çeqel	çakal	chacal	jackal
wehş : beraz	domuz, yabani domuz	cochon, sanglier	pig
welatî : hemwelatî, hemşerî	hemşeri, yurttaş	compatriote	countryman, countrywoman, compatriot
wel wel : wey wey	bak hele, vay be	ça alors ! oh là là !	well ! Oh, I say !
weh weh	sığırlara seslenirken kullanılan söz	onamotopée utilisée pour inciter le bétail à avancer, etc.	an noise made to make cattle move
werziba : werzeba	kuzeydoğu rüzgarı	vent du nord-est	north-east wind
west : raht bûn, qerimîn, betilîn	yorgunluk	fatigue	tiredness
westa xwe derxistin : bihna xwe vekirin	yorgunluğunu çıkarmak	prendre du repos, se délasser	to take a rest
westiyan, betilîn, raht bûn	yorulmak	se fatiguer, être fatigué	to get tired, to be tired
westandin : betlandin, raht kirin	yormak	fatiguer	to tire, to fatigue
westiyayî : westî, raht, betilî	yorgun	fatigué	tired
weş : xiş, taqet	hal, takat	force, puissance	potency, strength, power
ji weş ketin an bê weş ketin	halden düşmek, takatten düşmek	être à bout de force, ne plus avoir la force	to be exhausted, at the end of one's tether
bêweş	halsiz, takatsız	à bout de force, très faible, anémique	forceles, very weak
tê de weş nemaye : taqeta wî nemaye	takati kalmamış	il (elle) n'a plus de force, plus d'énergie	he (she) no more energy
weşek	döküntü tütün	débris de tabac	tabacco debris on remnants
wêrîn	cesaret etmek	oser	to dare
wirîne : werîne !	getir !	amène, apporte !	bring it !
xag : xav, xang	çiğ, ham	cru, non-cuit, écru	raw, uncooked
xagî : xavî, xangî	çiğlik, hamlık	crudité	rawness, crudeness
xalîçe : xaliya biçûk	küçük halı	petit tapis	small rug
xap : pûngal	folluk	nid de poule, pondoir	nesting box for hen
xapxapk : pelqeçîçik, çildank, berkurdk, xebxeb	kuş ya da tavuk kursağı	jabot	craw of a bird or chiken
aşik, destarok	taşlık	gésier	gizzard
xaşêl	kullanılmamış olan giysi ya da eşya	objet ou vêtement flambant neuf, non utilisé	brand new object or cloth
xav : deziyê xav, benê xav, qumaşê xav	şağlam olmayan, dayanıksız (iplik, kumaş)	fil ou tissu peu résistant, peu solide	weak thread or cloth
xavik : dolmend, meles, çît, çarik	tülbend	foulard de gaze de coton	gauze
xax : xaîle, teşqele, bela	bela, musibet	tourment, adversité	torment
xaxên giran an nemayî anîn serê yekî	birinin başını görülmemiş belalara sokmak	infliger à quelqu'un des tourments inouïs, accabler qqn, mettre qqn. au pilori	inflict excexxive torments on someone, put them to the pilory
xax û tore : halê rezaletiyê	rezaletlik durumu	opprobre, infamie	infamy
xebrîşok, xevrîşok, xemîşok, xeberoşk : çîrok	masal	conte	tale
xemsar : sersar	ihmalkar	négligeant	negligent, careless
xemsarî : sersarî	ihmalkarlık	négligence	negligence
xeniqok : xendekûk, xendekoke, kuxira reş	boğmaca	coqueluche	whooping cough
xerat : dartaş, necar, dartiraş	marangoz	charpentier	carpenter
xeritandin	yontmak	aplanir, dégrossir, découper (bois)	to plane, smooth or cut wood
xeritî	yontulmuş	dégrossi, aplani	planed, smoothed
xewar, xewte, xewîn	çok uyuyan, uykucu	grand dormeur	fond o sleep, great sleeper
xeste : xestexane, nexweşxane	hastahane	hôpital	hospital
xewgêr : xewger	uyurgezer	noctambule	night-time reveller
xewirandin : xeriqandin	bayıltmak	endormir, évanouir, anesthésier	to make faint, to narcotize
xewirîn : xeriqin, dil xewirîn, ji xwe çûn, dil jê çûn	bayılmak	s'évanouir, perdre connaissance	to faint
xêra Xwedê !	bundan iyisi can sağlığı	à la bonne heure !	God willing !
xêr û bêr : bereket	bolluk, bereket	abondance, fécondité, fertilité	abundance, fruitfulness
xik û xalî : xil û xalî, xir û xalî	bomboş, ıssız, ıpıssız	désert, vide, sans âme qui vit	desert, empty, without a living soul
xilç : gulç	kenger çıkarmada kullanılan ucu sivri değnek	bâton à l'extrémité aiguisée utilisé pour déterrer des tubercules	digging stick
xilorîk : gijlok, teyrok an zîpika hûr	taneleri fazla iri olmayan dolu	grêlon	hailstone
xiloxwarî : çelexwarî	eğri büğrü, çarpık çurpuk, yamrı yumru	crochu, tarabiscoté, tordu	hooked, twisted
xinanî	nezle ya da başka nedenden dolayı burnu tıkanmış olan	qui a le nez bouché à cause d'un rhume, etc.	has a blocked nose because of a cold

xincik	yırtık pırtık, eskimiş giysi	haillon, vêtement très usé en lambeaux	rags, worn out clothes
xir	penis	pénis	penis
xirçik pirçik	bez parçacıkları vb şeyler	bouts ou lamelles de tissus	bits or shreds of cloth
xirêf	işlenmemiş ham keçi tulumu	outre en peau de chèvre non tannée	a gourd of untanned goatskin
xirnik: mendek	tavşan yavrusu	levraut	leveret
xironek: zengila biçûk	ufak çıngırak	clochette, grelot qu'on passe au cou des agneaux	little bell
xirpik: kirkirk, kirkîrok	kıkırdak kemiği	cartilage	cartilage
xirpo: beredayî	hergele	individu vulgaire, malotru	boor vulgar and unscrupulous fellow
xirtikî bûn	burkulmak	se fouler, se faire une entorse	to be sprained
xirxolte	külüstür	vieillerie, rouillé, miteux	shabby, out of date
xirûş: xwîşrîk	vucutta alerjiden oluşan sivilceler	bouton de fièvre dont l'éruption est généralement due à une allergie	a pimple, generally due to an alergy
xiştîn	hışırtı, hışırdama	froissement	rusthing noise
xişxişok	çıngırak	hochet	rattle
xiya	deveyi ıhtırırken kullanılan sözcük	cri lancé pour faire poser ou asseoir le chameau	a cry made to make camels move
xiya kirin	ıhtırmak	faire poser, asseoir le chameau	amke a camel sit or crouch
xîcır	çakıllık yer, çakıllık	terrain pierreux, pierraille	stony soil.
xîldank	diş otu, kılır	visnage	bishop's weed
xopan: kambax, wêran, kavil, xerabe	yıkık, harap yer	ruine	ruins
xopan kirin	yıkmak, harap etmek, viran etmek	ruiner, ravager, faire tomber en ruines	to ruin, to shatter, to destroy
xortik: sengele	13-18 yaşları arasındaki genç	adolescent	teenager
xu lê boqandin, xwe lê boq kirin	sarkıntılık etmek	molester, harceler sexuellement, se frotter contre qn	to molest, to beset (a lady), to harass
xu xewisandin	kırıtmak, cilve yapmak	faire des coquetteries, faire des avances	to becoquettish; to put on coquettish aire to make advances to sb, to come on to sb
xudarîk: xweverît, bixweverîtî, qûnbigû	altını pisleten anlamında hakaret sözcüğü	merdeux	shit, asshole
xugirtî	tutumlu	économie	thrifty
xulmaj: xilmaş, niqhîşk, xirmaş	uyuklayan	somnolent	drowsy
xulmaj bûn	uyuklamak	somnoler, piquer du nez	to drowse, to be sleepy
xunavî: barana sivik	çilenti, serpinti	bruine	drizzle
xurde: hûrmûr, hûrde	hurda	ferraille, déchets	scrap (metal)
xure: zikîn, ziko	obur	glouton, cupide	glutonous, greedy
xurikandin: diqdiqandin, qidqidandin, xudxudandin, qidîlank vekirin	gıdıklamak	chatouiller	to tickle
xurikî	gıdıklanma	chatouillement	tickling
xwa: wa, wa weylê	vay be, öyle mi ?	ah bon ?	is that so ?
xwanê: xuyanî, xuya, diyar	görünen	visible, en vue	visible
xwanê bûn	görünmek	apparaître, être en vue, être visible	to appear, to be in view, to show off
xwe: xweh, xwişk, xweng, xweying	kızkardeş	sœur	sister
xwezî	tükrük	salive	saliva
xweziya xwe daqurtandin	yutkunmak	avaler sa salive	to swallow his/her saliva
tûk, tif	tükrük	crachat	spit
girêz: gilêz, gilîz	salya	bave	dribble
xwezî	dilek	vœu, désir	wish
bi xweziyan dest nagihê baqê keziyan	(sadece) dilemekle cananın zülfüne ulaşılmaz	ce n'est pas avec des vœux qu'en accède aux tresses de la bien-aimée	it is noz by wishing that one gains ones beloved's locks (of hair)
xweziya xwe bi yekî anîn	birine imrenmek	envier qqn	to envy s.o.
xwezîka, xwezî	keşke	j'aurai aimé, si seulement	I wish
xwêdank	tuzluk	salière	saltcellar, saltshaker
xwînî	boynunda kan davası olan, kanlı	sanguinaire, meurtrier	murder
xwînmistî : belakir	aşırı belalı, azgın kimse	belliqueux, querelleur	bellicose, belligerent
xwînsar : ruhsar	sevimsiz	déplaisant	unattractive, unlikable
xwînşîrîn : xwîngerm	sevimli	sympathique, carmant, aimable	charming, lovable, affable
yekane	erkek domuz	cochon mâle	pig
mahû : mehû, mawîk	dişi domuz	truie	sow
yom : yûm, oxir	uğur	présage, augure	pressage, omen
bê yom : bê yum, bê oxir	uğursuz	de mauvais augure, qui porte-malheur	ominous
zar û zêç : jin û zarû	çoluk çocuk	femme et enfants, famille	house hold, wife and children
zarçepel	patavatsız, münasebetsiz	impertinent, sans tact	impertinenet, tactless
zar zar : zarezar	inleme, inilti, zarizar	gémissement	groaning
zeng : jeng, zincar	pas	rouille	rust
zengarî bûn : jengî bûn, zincarî bûn	paslanmak, pas tutumak	être rouillé, se rouiller	to become rusty to get rusty
zengarî kirin	paslandırmak	rouiller	to rust, togo rusty
zengarî : jengî, zincarî	paslı	rouillé	rusty
zerojankî : zermihî, zerhimî, zrotankî	sarıya çalan, açık sarı	jaune pâle, jaunâtre	yellowhish, pale yellow
zêrzemîn : jêrzemîn	boddrum, serdab	cave	cellar
zêvistanî : zêstanî, zihistanî, çile	loğusa	(femme) qui vient d'accoucher, accouchée	woman after childhirth
zik dayîn	duvar (bel vermek)	s'affaisser (mur)	to sink, to subside (for a wall)
zikreş	kıskanç, çekemeyen	jaloux, envieux	jealous, envious
zikşewat : dilşewat	yüreği yanan, yakınlarına bağlı	qui a le cœur sensible, qui se soucie des autres	soft hearted, concerned for others
zikşewitî : dilşewitî	yüreği yanık, duyarlı	très sensible, écorché vif	over-sensitive, thin skinned
zilût : zelût, rût	tüysüz, çıplak	nu, dénudé	nude, bare, bald
zîlanzer	kengerin yeni filizlenmiş olanı		
zîz bûn	kendi çevresinde dönmek, kendi ekseni etrafında dönmek	tourner autour de soi, pivoter	to revolve, to pivot
zo : cot	çift	pair	even, even-numbered
zo-fer : kit û cot, fer û cot	"tek mi çift mi ?" oyunu	jeu de "est-ce pair ou impair?"	"is it odds or evens"
zornaq	kapının arkasına konan tahta sürgü	planche de bois mobile placée derrière une porte qui en s'engouffrant dans le mur la ferme de l'intérieur	a wooden bar socketed into a wall to keep a door barred
zox kirin : zival kirin, zivar kirin	deriyi uzun parçalar halinde kesmek, uzunlamasına dilimlemek	découper le cuir en lamelle longitudinales	to cut leather in longitudinal strips
zwîrî	solucan	ver, parasite	worm

Îdyomên kurdî

Amadekar : Mustafa AYDOĞAN

kurdî	tirkî	fransizi	înglîzî
kumê Elo li serê Celo (an welo, belo) kirin / kumê elo danîn serê celo	ali'nin küllahını weli'ye giydirmek	se débrouiller faire marcher habilement ses affaires sans fonds propres, (litt.) : mettre le bonnet d'Elo sur la tête de Celo; déshabiller Paul pour habiller Pierre	skilful at running a business on a shoestring ; robbing peter to pay paul
kumê wî ji rastiyê qetiyaye	doğru söylemeyi adet edinen ve bu nedenle zarar görmüş, doğrucu davut	(litt.): son bonnet s'est usé à force de dire la vérité: se dit pour une personne qui, en toutes circonstances, parle avec franchise et qui en subit les conséquences	(litt.) his hat is zorn out from speaking the truth ; said about someone who in all circumstances speaks his mind and suffers the consequences
kund li dewsa (şûna) warê wî dixwîne	ocağı sönmüş, ocağında baykuşlar ötüyor, harap olmuş	(litt.): le hibou chante dans son campement, il est ruiné, anéanti	to be ruined, wiped out ; (litt.) an owl hoots in his camp
kûpê gû, tûrê gû, meşka rêxê, kûpê gemarê	bok küpü	merdier	a mess, (litt.) a shit heap
kûreya derewan, mala derewan, kana derewan, kupê derewan, xana derewan, kuşkuşe, kufika derewan	yalan makinası	(litt.): manufacture ou mine de mensonges, si dit de qqn. qui ment beaucoup, mythomane	a mine of lies ; said of a congenital liar
kurk ketin, bi qup ketin, kurk bûn, li malê kurk ketiye, li malê ketiye kurkê, li malê bi qup ketiye	evde kuluçkaya oturmuş, evden çıkmıyor	(litt.) : il est en couvaison: il ne sort pas de chez lui, il s'enferme chez lui	he has locked himself at home, does not go out (litt.) he is hatching
kurka li avê hilanî	halden düşmüş, perişan	exténué, épuisé	exhausted
kurkê qetiyayî : bû cil û kete min	baş belası, atsan atılmaz satsan satılmaz	se dit de qqn. ou de qqch. dont on ne peut pas se débarrasser	an expression to descibe so or sthg one can't get rid of
kurm tê de livîn, gêrîk (mûrî) di qûnê de gerîn (bûyîn), xwê tê de bûyîn	yerinde duramayan	(litt.) : des fourmis remuent dans son cul : il ne se tient pas en place; il ne cesse de bouger	he has ants in his pants
kurmê darê	belası bünyesinde	(litt.) : le ver dans le fruit, autodestructeur, personne qui nuit à son entourage, qui cause la perte des siens	a person who endangers those around him (litt.) the worm in the fruit
kurmê eyûbî (bû kurmê eyûbî)	kurtulunamayan bela (eyüp peygambere uzun süre musalat olan kurt gibi)	un mal persistant, dont on ne parvient pas à se défaire	a persistant ill one is unable to get rid of
kurmê şîrî	değişmeyen huy	nature caractère, qui ne change pas	an unchanging nature or character
kurmê wî neşikestin (kurmê wî naşike)	bir şeye doymamak, doymak bilmeyen	en redemander, s'adonner sans cesse à qqch. à une passion	to ask for more, to persist in a habit or passion
kurmê xwe şikênandin (şikandin)	kurdunu dökmek	réaliser une action longuement désirée, céder à une tentation, s'adonner à une habitude	to achieve sth long desired, to give way to temptation, to be slave to a habit
kuştiyê di ber xelkê de, kedkiro ji mala qasê re, kedkiro ji xwe nekiro	başkaları için ter döken, emek sarfeden, emeğinden yararlanmayan	qui se tue à la tâche pour autrui	
lawê roja xwe : keysperest	fırsatçı, günlük çıkarları peşinde olan, güvenilmeyen	opportuniste, non fiable	an opportunist ; unreliable
lawendê karê xwe : ehlê karê xwe	işinin eri	expert, qui connaît son affaire	an expert
lê bû derê hîz : ji çar aliyan de deriyên teşqeleyan lê vebûn	her taraftan kuşatılmak, bir çok sorunla karşılaşmak	être pris par un engrenage, être confronté à une avalanche de problèmes	to be caught in a vicious spiral
li ber pahn bû, di nav lepan de rohn bû	içinden çıkamamak, içinden çıkılmaz duruma düşmek	s'empêtrer, s'embrouiller	to get tangled
lê bû xaniyek û şeş derî	çıkış yolu bulamamak, çıkmaza girmek	être dans l'impasse, ne pas trouver d'issue	to be at a dead end
lê sor bûyîn	bir işi canı gönülden yapmak, kendini iyice bir işe vermek, bir işe (birine) dört elle sarılmak	s'adonner avec ardeur a qqch.	to engage in something aith enthusiasm
lê sor kirin	kızıştırmak, tahrik etmek	exciter, provoquer, exhorter	to incite, provoke, exhort
li hev sor bûn	kapışmak, kızışmak	s'enflammer, s'exciter mutuellement, s'empoignier avec ardeur	to exite or provoke one another
li hev sor kirin	kızıştırmak, kapıştırmak	ramonter, exciter qqn. contre qqn.	to incite so against so else
ketin bin yekî	birini kandırmak, etkilemek	influencer, remonter qqn.	to influence or incite so
kolan pîvandin	kaldırım mühendisliği yapmak	passer son temps à battre le pavé	spent ones time walking the streets, the stones
li benda girêkan bûyin	köprüyü geçinceye kadar ayıya dayı demek, işini bitirinceye kadar herşeyi sineye çekmek	qui accepte tout, flatte les autres le temps de parvenir à ses fins	
li ber çavan reş bûn	gözünde kararmak	(litt.) : devenir noir aux yeux de qqn., tomber en disgrâce	to fall into disgrace
li ber çavan reş kirin	gözünde karartmak	discréditer, disgracier qqn., provoquer la disgrâce de qqn.	to discredit or disgrace so
li ber hilma yekî bûyîn, ketin ber bîna yekî	avutmak, teselli vermek, birinin tesellisi olmak	consolant qqn. servir de consolation à qqn.	to console so
ker jê nakule	kimseye zararı olmuyor, zararsız	inoffensif, qui ne nuit à personne qui ne fait de mal à personne	inoffensive
li xwe girtin, bi stûyê xwe ve girtin	1) üstüne almak, alınmak; 2) kefil olmak	1) s'offenser, s'offusquer; 2) cautionner, servir de garant	1) to be offended; 2) to sponsor or guarantee so
li ber ketin, bi ber ketin	1) üzülmek, etkilenmek; 2) değmek, değerı olmak; 3) kavramak, anlamak	1) être affecté, se chagriner, s'en faire; 2) valoir la peine, 3) comprendre	1) to be moved, sad; 2) to be worth the trouble; 3) to understand
li min	bana ait, bana birak	laisse-le à moi, j'en fais mon affaire	leave it to me
lêva xwe daliqandin	dudak sarkıtmak, surat asmak	faire la gueule, faire la tête	to sulk
li bayê bezê	rüzgar hızıyla	en coup de vent, très vite	like the wind, very fast
li bejnê hatin	yakışmak	seoir, être seyant, convenir	to suit, tobe suitable
li bejna wî tê	tam ona göredir, tam da ona yakışıyor	ça lui va bien, c'est tut lui	it suits him
li pelika guhê dîwaran ketin	işsiz güçsüz dolaşmak	battre le pavé	walk the stones

Cureyên laşê mirovan û îdyomên jêçêkirî

Amadekar : Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransizi	înglîzî
qûn	göt, kalça, kıç, popo	cul, fesse, croupe, arrière-train	buttock, arse, bottom
qûnçewal, qûn cuhal	iri yayvan kalçalı, torba götlü	gros cul qui a de grosses fesses larges comme un gros sac	fat bottom, has a bottom as big as a sack, fat assed
qûnheban, qûnhinban	tulum götlü	qui a des fesses larges et plates	having an ass like an inflated wind bag
qûnfireh	korkak	poltron, lâche	coward, poltroon
qûngiran, qûnterik, qûnpehn	tembel	paresseux	lazy
qûnsist	hantal	lourdaud	sluggish
qûnziwa filitîn	bir işten fazla zarar görmeden sıyrılmak, paçayı kurtarmak	se tirer d'une affaire sans trop de dégâts	to get off scot free
qûnbigû	götüboklu, adi, değersiz	merdeux	asshole, shit
qûnalêz	yağcı, yaltakçı	lèche-cul	arse-licker, ass kisser
qûngerm	konuk evinde yerinden kalkmasını bilmeyen	qui s'incruste chez les gens	
qûntazî	yoksul, giyecek şeyi olmayan, kıçı çıplak	indigent, très pauvre, (litt.) qui a le cul nu, qui n'a pas de quoi se vêtir	very poor, indigent, bare arsed, wearing tatters
qûndiryayî, qûn çiryayî	pantalonun arkası sökülmüş ya da yırtılmış	qui a le fond de son pantalon déchiré, décousu	someone who has the seat of his trouser storn or unstiched
rih, rû, riden, rîş	sakal	barbe	beard
rihdirêj	uzun sakallı	qui a une barbe longue	long beard
rihsor	kızıl sakallı	qui a une barbe rousse	red beard
rihspî	aksakallı	qui a une barbe blanche	white beard, grey beard
rihtapan, rûtapan, rûdergeh	geniş sakallı	qui a une large barbe	road beard
rîgaz	çok uzun sakallı, sakalı bir arşın olan	qui a une barbe longue	long beard
rihbizin, rînêrî	keçi sakallı	qui a une barbiche	goatee
rîgijik, rîgij	süpürge sakallı	qui a une barbe hirsute comme un balai	hairy beard, like a broom
rihxingilok	kıvırcık sakallı	qui a une barbe frisée	fuzzy beard
rihjujî	kirpî sakallı	qui a une barbe hérissée	brisley
rîtopik	çember sakallı	qui a une barbe ronde	round beard
rîhspî, rîspî	yaşlı, deneyimli, aksakallı	barbe blanche, sage	a grey-beard, an elder
rû	yüz, çehre	visage, face	face
rûgewr, rûspî	ak tenli	qui a le teint clair	clear or fair complexion
rûgirover	top yüz, yuvarlak çehreli	qui a le visage rond	round faced
rûheyv, rûhîv	ay yüzlü	qui a le visage beau comme la pleine lune	a faice as beautiful as a full moon
rûpehn, rûpan	geniş yüzlü	qui a le visage large	a broad face
rûsor	kızıl yüzlü	rouquin(e)	a red head
rûçir: rûçarox, rûçerm, rûqaîm	arsız, yüzsüz	effronté	shameless
rûfener	ışık saçıcı yüzü olan	éblouissant(e)	dazzling
rûgeş	şen yüzlü, şen	radieux, rayonnant(e)	radiant
rû dan	yüz vermek, şımartmak	gâter, traiter avec trop d'indulgence	to spoil
rûgirtî, rûstandî	yüzalmış, sımarmış	gâté, impertinent	spoilt, impertinent
rûşûştî	yüzsüz, şımarık	effronté, gâté	spoilt, shameless
rûken, rûbiken	güler yüzlü	souriant(e), rieur(se)	smiling , laughing, cheerful
rûnerm	yumuşak yüzlü	doux, qui a un caractère agréable	pleasant, sweet-tempered
rûperi	peri yüzlü	qui a un visage de fée	has a face like a fairy
rûreş	yüzü kara, kabahatlı, rezil	fautif, coupable, déshonoré	disgraced
rûsar	1) soğuk yüzlü, sevimsiz, cana yakın olmayan; 2) mahcup	1) froid, réservé, 2) honteux, repentant	1) cold, reserved 2) ashamed, repentant
rûspî	yüzü ak, aklanmış	blanchi, qui a la tête haute, qui sort favorablement d'une épreuve	cleared, someone who has emerged blameless from a trial
rûtirş	suratını ekşiten, asık suratlı	renfrogné	sullen
serî : ser kelle, qaf	baş, kafa	tête	head
serkundir, serkulind, sercimcim, sergogim	oldukça iri kafalı, kabak kafalı	qui a une tête démesurée en forme de courge	an extremely big head, a head shaped like a marrow
sermezin	iri kafalı	qui a une grosse tête	big headed
serreş	kara kafalı	qui a une chevelure noire	black haired
sersor	kızıl saçlı kafa	qui a une chevelure rousse	red haired
serspî, sergewr (li hin deveran)	ak saçlı	qui a une chevelure blanche	white haired
serzebeş	kafası karpuz şeklinde olan	qui a la tête en forme de pastèque	has a head the shapr of a water melon
sergindor	kafase kavun şeklinde olan, iri ve yuvarlak olan	qui a la tête ronde en forme d'un gros melon	has a round head shaped like a big melon
serçekûç	çift kafa	qui a une tête avec deux protubérances	has a head with two proturbences
serzelût, serrût, sergirûz	dazlak kafa, saçını kökten kestirmiş	qui a le crâne rasé	has a shaven head
sergolik	öküz kafalı	tête de veau	a head like a calf
serker	eşek kafalı	tête d'âne, qui a la tête dure	a head like a donkey
sergurî, serkeçel, keçel	kel fafa, dazlah kafa	chauve	bald
sergot	başı açık	qui a la tête découverte	head uncovered
sertûjik, serşûjin	sivri kafa	qui a le haut du crâne pointu	has a skull coming to a point on top
serconî	kafasının tepesi düz olan, yassı kafalı	qui a le haut du crâne plat	has a flat top of his head
sermazî	küçük oval kafalı	qui a une tête menue et ovale	has a small oval head
sergadoş	kazan kafalı	qui a la tête cylindrique	has a cylindrical head
serşonik	arkası düz kafa	qui a l'arrière de la tête plat	has a flat back of his head
serhişk, serreq, kellereq	inatçı, sert kafalı	entêté, têtu, obstiné	stubborn
qafqalind	kalın kafalı, anlayışsız, budala	tête dure, obstiné	stubborn, hard headed
serêzing	odun kafalı	tête de bois	wooden headed
serbilind, serberz	başı dik, onurlu	qui a la tête haute, digne	dignified ; holds his head high
serfiraz	1) müşerref, 2) başarılı, 3) galip, muzaffer	1) honoré; 2) qui réussit; 3) vainqueur	1) honoured; 2) successful; 3) a winner
serfirazî	1) onurlanma, 2) başarı, 3) zafer, galibiyet	1) fierté; 2) succès; 3) victoire	1) pride; 2) success; 3) victorious
sermest	mest olmuş, sermest, esrik	ivre (de joie, de plaisir)	drunk (with joy or pleasure), intoxicated
sergiran	ağır başlı, oturaklı	posé, pondéré, sérieux	steady, serious, solemn
sernerm	uysal	docile	docile
sersar	ihmalkar	négligeant	careless, neglectful
sergerm	kolay tahrik olan, fazla düşünmeden hareket eden	qui a le sang chaud, vif, agité, remuant	hot blooded

serserî	serseri	vagabond, clochard	a tramp, a vagabond
serşor, sernixwîn	başı eğik, başı önünde olan	qui a la tête basse	humiliated
sernizim	edepli, sayğıdan dolayı başı önünde olan	qui a la tête baissée à cause d'une faute, d'un pêché	has a bowed head because of a fault or sin
serpel, serbipêl	utançtan ya da bir kabahatten dolayı başı eğik, başı önünde olan	qui a la tête baissée à cause d'une faute, d'un pêché	has a bowed head because of a fault or sin
serniz	içten, hesaplı, sinsi	sournois, calculateur	sly, calculating
serxweş	sarhoş	ivre	drunk
serxalî	boş kafalı	écervelé, qui n'a rien dans la tête	brainless, empty headed
serjinik, serpirik, serjinkok	1) kılıbık; 2) kadın işlerini yapan	1) qui se laisse mener par sa femme; 2) qui s'adonne à des occupations traditionnelles des femmes	1) hempecked husband; 2) does tasks traditionally done by women
serberdayî, serberedayî	1) başıboş, bağlantısız; 2) evlendirilmemiş erkek	1) vagabond; 2) sans attache, non marié	1) vagabond, tramp; 2) untied, unmarried
sergiredayî	evlendirilmiş erkek	(litt.) homme dont la tête est attachée, marié	(litt.) has his head tied, married
bê serî	başsız, öndersiz	privé de chef	lacking a leader or head
stû, sî, hustu, sto	boyun	cou	neck
stûdirêj	uzun boyunlu	qui a un cou long	long neck
stûga	boynu çok kısa olan	qui a le cou très court	short neck
stûkut, stûkin, stûqut	kısa boyunlu	qui a le cou court	short neck
stûlegleg	leylek boyunlu	qui a le cou très long comme celui d'une cigogne	very long neck like a stork
stûqalind	kalın boyunlu, enseli	qui a un gros cou, le coup épais	a thick neck
stûquling	kuğu boyunlu	qui a le cou de cygne	a stork's neck
stûzirav	ince boyunlu	qui a le cou mince	a slender neck
stûxwar	boynu bükük, öksüz	pauvre, misérable, abandonné	poor, miserable, abandonned
stûşkestî, stûfirî !	boynu kırılası, boynu devrilesi	(litt.) que ton cou soit brisé, crève !	(litt.) may your neck be broken, die
tilî : lipil, tibil, til	parmak	doigt	
tilîdirêj	uzun parmaklı	qui a des doigts longs	long fingered
tilîkin	kısa parmaklı	qui a des doigts courts	short fingered
tilixatûn	parmakları düzgün ve alımlı, hatun parmaklı	qui a des doigts gracieux, ((litt.)) doigts de dame	has graceful fingers (litt. ladies fingers)
tilîzirav	ince parmaklı	qui a des doigts minces	slender fingers
tûncik : ehvik, temerî, temenî, temberî, tenborî, temborîk, tûmik, tûşik	kahkül, kakül	mèche	locks, hair
tüncikbadayî	bükülü kahkül	qui a la mèche frisée	fuzzy hair or locks
tüncikdirêj	uzun kahküllü	qui a une longue mèche	long locks
tüncikreş	siyah kahküllü	qui a une mèche noire	black locks
tüncikxelek	halkalı kahkül	qui a une mèche	has a
zik	karın, göbek	ventre	stomach
zikbilind, zikbel	göbeği kalkık	qui a un gros ventre élevé vers le haut	has a high stomach
zikçewal, ziker	göbeği çuval gibi	qui a un ventre gros et large comme un sac	fat stomach, big as a sack
zikjêr : zikdaketi	göbeği düşük	qui a un gros ventre penchant vers le bas	has a big stomach that hangs down
zikkundir	iri karnlı	qui a un gros ventre	a fat stomach
ziktilêlî	iri ve dışa çıkık göbek	qui a un gros ventre protubérant	a protruding stomach
zikmeşk, zikhinban	tulum göbekli	qui a un vente gros en forme d'outre	a big stomach like a gourd
zikmar	hain, sinsi	traître, sournois	treacherous, sly
zikmezin : xure, hûrmezin	obur, doymak bilmeyen	glouton, insatiable	gluttonous
ziko : hûro	1) göbekli, 2) midesine düşkün	1) ventru; 2) glouton	1) big bellied; 2) gluttonous
ziktêr : çavtêr	gözü tok	satisfait, rassasié	satisfied, well fed
zikwerimî, bizik	hamile	enceinte, grosse	pregnant, big
zikliberdev	doğum zamanı yaklaşmış	((litt.)): qui a le ventre à même la bouche, femme enceinte proche de son terme	(litt.) has her belly near her mouth i.e. pregnqnt qn dnear her time
ziktijî : ji xwe razî	kendini beğenen	qui a une bonne opinion de lui, qui est content de lui, auto-satisfait	to have a good opinion of oneself, self-satisfied
ziman, ezman, zar	dil	langue	tongue
zimanbest, bêzar, bêzar û ziman	dilsiz	muet	dumb
zimandirêj	küstah, dili uzun	insolent, qui a la langue bien pendu, impudent	insolent, sharp tongued
zimangiran	konuşmada güçlük çeken	qui a du mal à parler, qui parle très lentement	has difficulty in speaking, speaks slowly
zimannazik	edepli konuşan	courtois, affable	curteous, affable
zimanşîrîn, zarşîrîn, zimanxweş, zarxweş	tatlı dilli	qui parle avec douceur, beau parleur	soft-spoken
zimanfis, zimantis	peltek	qui zézaie, qui zozote	lisper
zimantat, lalûte, tirtirî	kekeç, kekeleyen	bègue	stammerer
zimantûj manner	konuşmasında saldırgan olan	qui parle d'une manière agressive, blessante	speak in an agressive or wounding
zimantal, zartal	kaba dilli	grossier, malotru, qui parle d'une manière grossière	crude, ill spoken, rude
zimanmar	dilinden zehir akan	qui a une langue empoisonnée, haineuse	has a poisenous tongue
zimanreş, zimanpîs, zimanbigû	ağzı bozuk, küfürbaz	ordurier, grossier, qui parle vulgairement	crude, speaks vulgarly
zimanhilû, zimanşeyik	kimseyi incitmeden konuşan	qui a un langage lisse, qui parle sans blesser quiconque	smooth tongued
zimanzelal	açık ve anlaşılır şekilde konuşan	qui parle d'une manière claire, qui a une bonne élocution, éloquent	speaks clearly, has good elocution
zirav	öd	bile	bile
ziravqetî, ziravteqî, ziravpirçiyayî	ödü kopmuş	effrayé, peureux, (litt.) dont la vésicule biliaire a éclaté	afraid, timid
bêzirav	ödlek	poltron, timoré	timid, cowardly
zimanpak, zimanpaqij	temiz ağızlı	poli	polite
gun, gunik, pilik, ritil	erbezi	testicule, couilles	testicles, balls
gundiryayî : gunoyî, gunekî, gunosî, ritloyî	erbezi fıtığı	hernie testiculaire	inguenal hernia
gunsist	1) cesaretsiz, 2) iktidarsız	1) lâche, poltron; 2) impotent	1) cowardly, poltroon; 2) impotent
gunberan, gunikberan, pilikberan	koç taşaklı	(litt.) qui a des couilles de bélier, brave, courageux	(litt.) has the balls of a ram i.e. brave, courageous
ritilgîsk	sarkık testis	testicule pendant	has hanging testicles
parsûqalind, parsûstûr	kibirli, mağrur	hautain, arrogant, qui a de la morgue	haughty, arrogant
parsûxwar	zayıf, güçsüz	faible, impuissant	feeble, powerless

Termên trafîkê

Amadekar : Rojan HAZIM

kurdî	tirkî	fransizi	îngilîzî
rêya yekalî	tek yönlü yol	voie à sens unique	one way street
rêya dualî	çift yönlü yol	voie à double sens	two-way street
tengerê	dar yol	voie étroite	narrow track
rêya ji herdû rexan ve teng dibe (ji çepê ve, ji rastê ve)	iki taraftan daralan yol	rétrécissement de la chaussée	road narrows from both sides
rexerê	yol kenarı	accotement, bas-côté	verge
rêya fireh	genişleyen yol, geniş yol	voie élargie	wide road
xêzên rê, xiçên rê	yol çizgileri	lignes de route	road lines
xêza (xîça) nevebirî	tam çizgi	ligne continue	unbroken line
xêza (xîça) vebirî	kesik çizgi	ligne discontinue	broken line
xêza (xîça) nîvekê	yol ortası çizgisi	linge médiane	centre line, road median
zîkzak	zikzak	zigzag	zigzag
peyarê	yaya yolu	voie piétonne	pedestrian crossing, pedestrian street
çivaneka bitalûke ya rastê	sağa tehlikeli viraj	virage dangereux à droite	dangerous right turn
çivaneka bitalûke ya çepê	sola tehlikeli viraj	virage dangereux à gauche	dangerous curve on the left
çivanekên bitalûke yên rastê	sağa tehlikeli devamlı virajlar	virages dangereux à droite	dangerous curves on the right
çivanekên bitalûke yên çepê	sola tehlikeli devamlı virajlar	virages successifs à gauche	dangerous curves on the left
rêya ji herdu rexan ve teng dibe	iki taraftan daralan yol	voie qui se rétrécit de deux côtés	road that narrows on both sides
rêya ji rexê rastê ve teng dibe	sağdan daralan yol	voie qui se rétrécit à droite	road that narrows on the right
rêya ji rexê çepê ve teng dibe	soldan daralan yol	voie qui se rétrécit à gauche	road that narrows on the left
hevrazê bitalûke	tehlikeli yokuş	montée dangereuse	dangerous climb
nişîvê bitalûke	tehlikeli iniş	descente dangereuse	dangerous down-hill
durîyan	yol ayrımı	bifurcation	fork in the road
xaçerê	yol kavşağı	carrefour, croisée	crossroads
xaçerêya bêkontrol	kontrolsüz kavşak	carrefour libre	uncontrolled crossroads
rêya şoşe	şoşe yol	chaussée	causeway
rêya asfalt	asfalt yol	route asphaltée	asphalt road
pirik	köprücük	ponton	small bridge
pirtan	ağaç dallarından örtülü asma köprü	pont suspendu fait d'arbres et de branchages	hanging bridge made of branches ties together lengthwise
viyaduk	viyadük	viaduc	viaduc
asteng	engel	obstacle	obstacle
bariyer	bariyer	barrière	barrier
wergeryan	devrilmek	renverser, faire un tonneau	to be overturned


çivaneka bitalûke ya rastê


çivaneka bitalûke ya çepê


çivanekên bitalûke ya rastê


çivanekên bitalûke ya çepê


rêya ji herdu rexan ve teng dibe


rêya ji rexê rastê ve teng dibe


rêya ji rexê çepê ve teng dibe


hevrazê bitalûke


nişîvê bitalûke


xaçerêya bêkontrol

Devoka Botî* (I)

Amedekar : Cemal ONURSAL

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
hişîn: şîn, hêşîn	mavi	bleu	blue
fêkî: fêqî, meywe, mîwe	meyve, yemiş	fruit	fruit
pirteqal	portakal	orange	orange
karçik: hermî, hirmê	armut	poire	pear
şebeş: zebeş	karpuz	pastèque	water melon
tireh: tirî	üzüm	raisin	grape
gindur: gundor, qawin, kalek	kavun	melon	melon
gilyaz: gêlaz	kiraz	cerise	cherry
leymîn: leymûn, lîmon	limon	citron	lemon
mandalî: mandalîn, mandarîn	mandalina	mandarine	mandarine, tangerine
fisteq: fistiq, piste	fıstık	pistache	pistachis
guhuj: givîj, guhîşk, guwîj	akdiken	nerprun	blackckthorn
berî: belût, belot	palamut	gland	acorn
şehbelût: şebelot	kestane	chataigne	chestnut
teraqî	nektarin	nectarine	nectarine
hişinahî: hêşînahî, heşînatî	sebze	légume	vegetable
qitî: ecûr	acur	concombre russe	hairy cucumber
hîçhar: bîber, îsot	biber	poivre, paprika	pepper
lehne: kelem	lahana	chou	cabbage
gêzer: gizêr	havuç	carotte	carrot
bacanê reş: balîcan, bacanreş	patlıcan	aubergine	egg plant, aubergine
kulind: dolmik, rextik	kabak (dolmalık)	courgette	zucchini, courgette
kulind: kulindir, kundir	kabak	courge	marrow, squashe
kulindê mîranî, kulindê şirîn	balkabağı	potiron	pumpkin
xirtik	kıtır, kütek	cornichon	cornichon, pickled cucumber
bamî: bamye	bamya	gombo, okra	okra, gumbo, ladies fingers
kumfeqîrk: kvarik, karok	mantar	champignon	mushroom
sîrmû: sîrim	yabani sarmısak	ciboulette	chive
pirç: por	saç	cheveux, chevelure	hair
navbirh: navçav	iki kaş arası, belce	glabelle	supercilliary arch
ceynik: cênîk	şakak	tempe	temple
kepî: kepû, bêvil, poz	burun	nez	nose
kûrtîka çenê: çenegeh	çene çukurcuğu	fossette mentonnière	dimple in the chin
izman: ezman, ziman	dil	langue	tongue
şikefta dev: esmanê dev	damak	palais (bouche)	palate
izmanuk, izmanê kiçik: zimanok	küçük dil	luette	uvula
hiluq: aloq, behîvok, gelale	bademcik	amygdale	tonsil
raya didanî: reha diran	diş siniri	nerf dental	dental nerve

birh: birû, birî	kaş	sourcil	eyebrow
mişkulk: bijang, mijîlank	kirpik	cil	eyelash
bîbûk: bîbik, bîbok, bîbî	göz bebeği	pupille	pupil
sîvûk: sêvok, sêvik, sêvanik	oyluk kemiğinin, üst ucu	tête du fémur, extrémité supérieure du fémur	neck of femur
tenişt: kêlek	yan, böğür	flanc, côté	side, flank
qît: qîtik, çîq, paq, baq	baldır	mollet	calf
muhrik: movik, geh	omur	vertèbre	vertebra
parasu: parsû, pirasî, parsî	kaburga	côte	rib
kirkiruk: kirkirîtk, kirkirk	kıkırdak	cartilage	cartilage, gristle
pahnî: panî	topuk	talon	heel
gûzek: gûzik, gozik	aşık çıkıntısı	cheville	ankle, malleolus
tiliya beranêkê: tiliya beranî an beranê	başparmak	pouce	thumb
xîtkên dest: xêzikên dest	el çizgileri	lignes de main	lines of the hand
hinav	iç organları	entrailles	entrails, innards, guts
hinavçûn: navçûn, zikçûn	ishal	diarrhée	diarrhoea
patereş: fatereşk, sipil, dêdik	dalak	rate	spleen
rizyank: rizyane	rezene	fenouil	common fennel
filfil: îsota reş, bîbera reş	kara biber	poivre noir	black pepper
kuç: kevir, ber	taş	pierre	stone
çîtik: zil, leven, qamîş	kamış	roseau	reed
bindeq	fındık	noisette	hazelnut
hewdik	fidelik	pépinière	nursery, seedling bed
meştel	fide	plant	plant
mijmij: mişmiş, qeysî	kaysı	abricot	apricot
qerenfîl: qerefil, mêxik	karanfil	clou de girofle	plant
xeçxecuk: bûkik, bûkok, bûkanî	gelincik	coquelicot	poppy
simbil: sinbil	sümbül	jacinthe	hyacinth
sêwanûk: sîwanok	şemsiye çiçeği	ombellifère	umbellifer

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE

106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
www.fikp.org
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN
Réalisation : S. ILITCH & M. HASSAN